Bajarê paytextê Magdeburg
Beşa Karên Civakî,
Ciwan û Tenduristiyê



şêwirmendî | piştgirî | agahdarî

Rêbername – Kita
Agahiyên derbarê cihê Kita-yê yê zaroka we li Magdeburgê de

ottostadt magdeburg

Pêşgotin

Dayik û bavên hêja, malbatên hêja,

çûyîna Kita-yê alîkariya zaroka we dike ku fêr bibe, bilîze û hevaltiyên nû ava bike. Li ser vê riya pêşketinê, paytexta eyaletê dixwaze bibe rêhevalê Magdeburgiyên herî ciwan. „Rêbername – Kita" der barê vê mijarê de agahiyan pêşkêş dike û cûrbecûriya îmkanên lênêrînê yên li bajarê me nîşan dide.

Li vir hûn ê bibînin:
- agahiyan der barê tomarkirinê de,
- şîretan ji bo destpêka li Kita-yê,
- agahiyan der barê mesrefên gengaz de û herwiha
- kesên têkiliyê ji bo serlêdan û piştgiriyê.

Em ji we re wek malbat destpêkeke xweş û ji zaroka we re li Kita-yê kêfxweşiyeke mezin dixwazin.

Simone Borris
Şaredara Giştî ya Paytexta
Eyaletê Magdeburg

Dr. Ingo Gottschalk
Berpirsyarê Karên Civakî,
Ciwanan û Tenduristiyê

Ji bo pirs û piştgiriyê, tîma lênêrîna rojane ya zarokan bi kêfxweşî di xizmeta we de ye:
www.magdeburg.de/Kinderbetreuung

Navenda rojane ya lênihêrîn û perwerdehiya zarokan çi ye?

Her zarok dikare here navendeke rojane ya lênihêrîn û perwerdehiya zarokan (Kita). Kita navendek e ku tê de zarok tên lênihêrîn, piştgirîkirin û alîkarîkirin. Li wir ew dilîzin û roja xwe bi zarokên din re derbas dikin.

Kita peyvek giştî ye ji bo:



Lênihêrîna rojane ya zarokan alternatîfek ji bo zarokên ji 0 salî heta destpêka dibistanê ye. Lênihêrîn di komên biçûk û malbatî de li gel kesekê ku karê lênihêrîna rojane ya zarokan dike pêk tê.

Çima divê zaroka min here Kita-yê?

- Zaroka we li Kita-yê tê lênihêrîn, piştgirîkirin û ji bo dibistanê tê amadekirin.
- Zarok piştgirîya zimanî distînin û zimanê Almanî fêr dibin.
- Zarok têkiliyên civakî ava dikin û bi hevalan re dilîzin.
- Kita wekhevbûna derfetê piştgirî dike.
- Kita malbat û zarokan bihêz dike.

Çûna Kita-yê ne mecbûrî ye. Çiqas zûtir zaroka we here Kita-yê, ew ê bêtir dem hebe ku zimanê Almanî û hemû şiyanên girîng ji bo dibistanê fêr bibe.

Meriv çawa dikare cihê Kita-yê bistîne?



Pirsan zelal bikin

☺ Kengê divê zaroka min here Kita-yê?
Nêzîkî salek berî destpêkê bi lêgerînê dest pê bikin.

🕘 Kîjan dema lênihêrînê ji bo me guncaw e?
Hûn dikarin di navbera 5 heta 10 saetan rojane de hilbijêrin.

💬 Ji bo me wekî dê û bav çi girîng e?
Cih, demên vekirîbûnê, an xalanên perwerdehiyê wek mînak piştgirîkirina tevgerê?

Dê û bav her dem nikarin cihê Kita-yê ku dixwazin bistînin. Carinan divê dê û bav rêçûnê bi piyan an rêwîtiyek bi otobûs an trênê plan bikin. Bajar ji bo vê yekê girêdana baş a veguhastinê heye.

Zû agahdar bibin

Di demek zû de li ser Kita û pîvanên xwe yên hilbijartinê agahdar bibin!

Hûn dikarin li ser Portala dê û bavên zarokan li vir dîtineke giştî û agahiyên destpêkê bibînin:

kitaplatz.magdeburg.de

Ger hûn şêwirmendî dixwazin an ji bo dîtina cihê Kita-yê hewcedariya piştgiriyê hebe, Şêwirmendiya Kita-yê ji bo we amade ye:

Şêwirmendiya Kita-yê
Wilhelm-Höpfner-Ring 1 | 39116 Magdeburg
kitaberatung@jga.magdeburg.de
0391 540 3131 an 0391 540 3261

Rezervasyona termînê ya serhêl




Lêgerîna cihê Kita-yê

Hûn dikarin zaroka xwe serhêl ji bo cihê Kita-yê tomar bikin = ragihandina hewcedariya cihê lênihêrînê.

Ji bo vê yekê Portala dê û bavên zarokan bikar bînin:
kitaplatz.magdeburg.de

Hesabek kesane biafirînin û bi lêgerîna cihê Kita-yê dest pê bikin. Ji bilî vê yekê, rasterast jî bi Kita-yê re têkiliyê deyne.

Ger hûn hewcedariya alîkariyê hebe, bi kêfxweşî serî li Şêwirmendiya Kita-yê bidin!
www.magdeburg.de/KitaBeratung



Cihê Kita-yê hat dîtin

Di ragihandina hewcedariya cihê lênihêrînê de jimareya têlefonê û navnîşana e-nameya we tê tomarkirin. Ger Kita cihê vala hebe, ew ê bi we re têkiliyê deyne. Dê termînek ji bo axaftinê bê danîn. Ger hûn hîn zimanê Almanî neaxivin, divê ji bo tomarkirinê û hemû axaftinên li Kita-yê wergerek saz bikin.

Ger wergerek nîne, hûn dikarin alîkarê rêber ji bo Kita-yê (Kita-Lotse) bixwazin:

Navenda Pirrengîyê • Stiftung Evangelische Jugendhilfe
0391 5628 2611
www.stejh.de/einrichtung/fachstelle-magdeburg/

Kita-Lotsen bi awayê dilxwazî û bêpere axaftinên dê û bav li Kita-yê werger dikin. Her wiha ew di demê alışandina zarokê bi Kita-yê de jî li Kitaanên Magdeburgê hevaltiyê dikin.

Ji kerema xwe ji bo axaftina yekem van tiştan bi xwe re bînin: nasname, belgeya jidayikbûnê, belgeya negativen ji bo mafê tenê yê xwedîkirina zarok, deftera vaksînan, wergêr ji bo pirsgirêkên zimanî

+ belgeyên din:

.....

.....

.....

Ger axaftin bi encamek erênî biqede, hûn dikarin peymana lênihêrînê îmze bikin Ger peymanek çênebe ji, kerema xwe lêgerîna cihê din bidomînin.

Peymana lênihêrînê

1. Peymanê kontrol bikin: Agahiyên we, demjimêra heyamê û saetên lênihêrînê rast in? Her aliyek maf heye ku bi rêzgirtina muhleta betalkirinê peymana lênihêrînê biqedîne. Muhleta betalkirinê di navbera 1 heta 3 mehan de ye.

   Muhleta betalkirinê li Kita-yê min: Ev ew dem e ku divê derbas bibe berî ku peymanek biqede û hûn peymaneke nû çêbikin. Ger hûn dixwazin peymanê betal bikin, divê hûn bi nivîskî ji Kita-yê re agahî bidin — gelek caran 1 heta 3 meh berê!

2. Bala xwe bidin rêzikên taybet: wek nimûne, gelo dê û bav divê pereyek zêde bidin?

3. Termîna alışandina zarokê bi Kita-yê zelal bikin û demeke bes plan bikin! Ma divê Kita-Lotse we û zaroka we re hevaltiyê bike?



Alışandina zarokê bi Kita-yê

Di dema yekem de hûn bi zaroka xwe re bi hev re diçin Kita-yê. Ev alışandin girîng e:
- Zaroka we hîn Kita-yê nas nake û hîn hevalên wî tune ne.
- Hûn nikarin zaroka xwe di destpêkê de tenê li Kita-yê bihêlin.
- Bi gav bi gav, demên ji hev cudabûnê çêdibin.
- Hûn li Kita-yê dimînin û her dem tê gihîştin.
- Ji kerema xwe li pey lihevhatinan bimînin.

Sebir bikin û ji xwe re dem bidin. Her zarok cûda ye. Gelek caran ji ber cudabûnê xemek mezin heye. Ev rewş dê baştir bibe û zaroka we dê bi kêfxweşî here Kita-yê.

Xwarin li Kita-yê

Li Kita-yê taştê, firavîn û xwarina piştî nîvro (Vesper) heye.

Xwarin bi gelemperî ji aliyê dabînkerê xwarinê ve tê şandin. Li gorî Kita û dabînkerê xwarinê, pêşkêşiyên cûda hene.

Xizmeta rojê ya tevahî taştê, firavîn, xwarina piştî nîvro û vexwarinan dihewîne.

Xizmeta firavînê tenê firavîn û vexwarinan dihewîne. Taştê û xwarina piştî nîvro dê û bav bi xwe re tînin.

Ger hatina we kêm be, hûn dikarin bi alîkariya Perwerde û Beşdarbûnê daxwaza dayîna lêçûnên firavînê bikin.

Ger zaroka we nikare here Kita-yê, wek mînak ji ber nexweşiyê, divê hûn xwarinê li cem dabînkerê xwarinê betal bikin!

Lêçûnên Kita-yê

Dê û bav beşdarî lêçûnên lênihêrînê dibin
= beşdariya lêçûnê

Mezinahiya beşdariyê girêdayî temenê zaroka we û dirêjahiya dema lênihêrînê ye. Ger hûn gelek zarok hene, hûn dikarin ji kêmkirinê sûd werbigirin.

Agahiyan hûn dikarin ji beşa beşdariya dê û bavên zarokan ya Jugendamtê bistînin.

Ger hûn alîkariyên civakî werdigirin (wek mînak ji Jobcenter), ew beşdarî bixweber nayê dayîn. Ger hûn nikarin beşdariya lêçûnê bidin, divê hûn daxwaznameyek pêşkêş bikin.

Ji kerema xwe e-nameyek bişînin:
elternbeitragsstelle@jga.magdeburg.de

Agahiyên zêdetir li vir bibînin:
www.magdeburg.de/elternbeitragsstelle

Ma ez dikarim alîkariya darayî bistînim?

Ger hatina we têr neke, hûn dikarin daxwaza alîkariya darayî bikin:

- betalkirina beşdariya lêçûnê
- Pakêta Perwerde û Beşdarbûnê:
  - firavîna hevbeş li Kita, lênihêrîna rojane ya zarokan, lênihêrîna piştî dibistanê û dibistanê
    Tenê firavîn! Ger Kita ya we xwarina tevahî pêşkêş bike, divê hûn taştê û xwarina piştî nîvro bi xwe bidin.
  - geştên rojekê û rêwîtiyên çendrojanî li Kita, lênihêrîna rojane ya zarokan, lênihêrîna piştî dibistanê û dibistanê.

"Pakêta Perwerde û Beşdarbûnê" çi ye?

Ev alîkariyek dewletê ye ku piştgirîya zarok, ciwan û mezinên ciwan ên ji malbatên ku pereyên wan kêm in dike. Hûn dikarin daxwaznameyek pêşkêş bikin, da ku wek mînak lêçûnên firavînê an rêwîtiyek bê dayîn.

Bajarê paytextê Magdeburg
Ofîsa Karên Civakî û Xanîyan
50.21 OCC / Perwerde û Beşdarbûn
Wilhelm-Höpfner-Ring 4 | 39116 Magdeburg

Agahiyên zêdetir li vir bibînin.

OTTO-CITY-CARD:

Nasnameya bajarê Otto-City-Card piştgirîya hem-welatiyan û malbatên Magdeburgê yên ku hatina wan kêm e dike, da ku bi bihayên kêmtir li gelek hevkaran beşdarî jiyana çandî bibin.

Ma zaroka min dikare cihê xwe yê Kita-yê winda bike?

Erê, ev gengaz e ger:
• beşdariya lêçûnê neyê dayîn,
• hûn zaroka xwe demeke dirêj (bê ragihandin û bê sedem) neynin Kita-yê,
• an jî ger pevçûnên mezin hebin.

Ger pirsên we hene an hûn hewcedariya piştgiriyê hebe: **www.magdeburg.de/kinderbetreuung**

Amadekirina ji bo destpêkê

Agahiyên girîng:

1. Divê hûn belgeya bijîşkî ya guncawbûna zarokê ji bo Kita-yê û belgeya vaksînan a zaroka xwe li Kita-yê pêşkêş bikin.

   Belgeya guncawbûna Kita-yê: Divê bijîşkek zarokan piştrast bike ku zaroka we dikare here Kita-yê. Ev belge divê zêdetirî 2 hefte kevn nebe.

   Belgeya vaksînan: Li Almanyayê vaksîna sorikê mecbûrî ye. Deftera vaksînan bi xwe re bînin.

2. Zarokê amade bikin: Pirtûkên li ser Kita-yê bixwînin, bi lîstikê mijarê nêzîk bikin. Dibe ku serdanên yekem an demên lîstikê gengaz bin?

Zaroka min li Kita-yê çi hewce dike?

Bi rêveberiya Kita-yê re bi hev re biaxivin ka hûn divê kîjan tiştan ji bo zaroka xwe bi xwe re bidin.

- ☐ Papûçên malê
- ☐ Taştê
- ☐ Kincên hundirîn
- ☐ Kincên guherandinê
- ☐ Çenteyek / çenteyê piştê
- ☐ Xwarina piştî nîvro
- ☐ Kincên zivistanê
- ☐ Kincên baranê (bot, kincên ji bo lîstika di heriyê de)
- ☐ Pampers û berhemên lênihêrînê

Xalên din:

.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....

Têketina di jiyana rojane ya Kita-yê de

Rêxistina rojeke asayî li Kita-yê rêkûpêk e û rêûresmên sabît dihewîne, ku ji van tiştan pêk tê:
• civîna sibehê
• pêşkêşiyên lîstin û fêrbûnê
• demên xwarinê û demên bêhnvedanê

Zaroka we baş li Kita-yê cih girtibe, ger ew:
• xwe baş û ewle hîs bike,
• rêxistina roja xwe nas bike,
• kesên nêzîk û bawerbar hebe,
• heval dîtibe,
• û ji lîstin û fêrbûnê kêfxweş be.

Dê û bav jî baş li Kita-yê cih girtine, ger:
• bi mamoste û xwedîlênihêrên zarokan re danû-standinek birêkûpêk hebe,
• beşdarî axaftinên pêşketinê û şevên dê û bavan bibin,
• bawerî hebe û têbîniyên girîng bi cidî bên girtin,
• hûn jî rêxistina roja Kita-yê nas bikin.



Agahiyên din ên girîng di dema Kita-yê de

Termîn û muhletan ji bîr nekin – bala xwe bidin agahiyên li panoyê!

Demên girtinê: Her Kita demên girtinê hene ku di wan deman de zaroka we nikare here Kita-yê. Di havînê de ev dem dikare heta 3 hefteyan bidome.

Nexweşî: Ger zaroka we nexweş be, nikare here Kita-yê.

Qezaya li Kita-yê: Ger li Kita-yê qezayek çêbibe, divê Kita we agahdar bike. Dibe ku vekolînek li cem bijîşkê taybet ji bo qezayên sîgortayê (Durchgangsarzt) pêwîst be.

Bijîşkê taybet ji bo qezayan çi ye?

Plana parastina zarokan

Her Kita planeke parastina zarokan heye. Ev planek e ku piştrast dike ku hemû zarok ewle û baş tên parastin.

Ji bo vê yekê li Kita-yê rêzikên zelal hene:

- Hemû bi rêzgirtin, bi dostanî û bê tundûtûjiyê bi hev re tevdigerin.
- Zarok dikarin “Na” bêjin.
- Karmend dizanin ku di demê pirsgirêkan de divê çi bikin.
- Dê û bav dikarin her dem bi pirs an xemên xwe re serî li Kita-yê an jî li Jugendamtê bidin.

Destpêka li Kita-yê

Projeya Kita-Einstieg piştgirîya malbatan û jî Kitaan dike.

- agahdarkirin û agahî li ser pergala lênihêrîna Kita-yê
- danûstandin ji bo malbatan di civîngehên wek komên lîstika pitikan de
- hevaltiyê û şêwirmendiya saziyan
- koordînekirin, perwerdekirin û navbeynkarîya Kita-Lotsen

Agahiyên zêdetir:
www.magdeburg.de/kita-einstieg

Mandala Kinderbetreuung
www.mandala-md.de/

Stiftung evangelische Jugendhilfe
stejh.de/kita-einstieg/

Kita-Einstieg Magdeburg

Notîz .....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....
.....

Sprache: kurdisch

Agahiyên çapemeniyê

Weşanger
Bajarê paytextê Magdeburg
Beşa Karên Civakî, Ciwan û Tenduristiyê
Jugendamt | Şêwirmendiya Kita-yê
Wilhelm-Höpfner-Ring 4
39116 Magdeburg
www.magdeburg.de

Dîzayn
Ofîsa Şaredara Mezin | Tîma çapemenî û karên ragihandinê

Weşan :
Çapa yekem (2026)

Gefördert durch
SACHSEN-ANHALT
#moderndenken